

**Der Ministerpräsident**
**des Landes Nordrhein-Westfalen**

2yê çîrîya pêşîn a 2020î

Liebe Mitbürgerinnen und Mitbürger,

Gelî welatîyên birûmet ên Mêr û Jin,
Di sibêrojê de hefteyên zehmet li pêşîya me ne. Di têkoşîna li dijî pêla didoyê ya şofa koronayê de ev meha Çîrîya pêşîn, meha biryarê ye.

Me ji bo pêşgirî û qaydeyên ku jîyana li Elmanyayê û Bakurê Ren-Vestfalyayê ji kokê ve biguherîne biryar da. Ez dizanim ku kêmkirin ji bo gelek kesan barek e û dê bibe sebebê zehmetîyên şexsî û aborî.

Ji ber vî awayî di van rojan de me vê divê: Hevkarî. Divê em bi kesên pîr û nexweş ên ku vayrûs ji bo wan gefeke kujer e, hevkarîyê bikin. Bi hemşîre û diktorên ku her roj mecbûr dimînin zorê bidin sînorên xwe re jî. Di van rojan de bi gelek birêxirên xwaringehan, rêncberên kulturê û xwedîyên karên serbest ên ku ji ber hebûna xwe fikarê dikin re jî.

Divê em di vê proseyê de mebestên xwe teqez ji dest nedin: Em van hemû tiştan ji bo parastina siheta yên herî bê parastin, vekirîhiştina navendên xwedîkirina biro û xwandingehan û dewamdarîya jîyana aborî dikin. Di vê babetê de dîsa kar dikeve ser mile me. Di şofa koronayê de qedera me di destê me bixwe de ye: Li mala xwe bimînin. Bi awayê kêmkirina pêvebûnên xwe, em ê karibin pirbûna mezin a enfeksîyonan hêdî bikin û sîstema xwe ya sihetê ya berhemdar dewam bikin.

Heta ji destê we bê bi kêm kesan re werin kêleka hev. Qaydeyên tecrîbekirî û testkirî pêk bînin: Navbera xwe û kesên din biparêzin, desten xwe bişon, her roj maske li xwe bikin.

Di vê dewra zehmet a fedakarîyê de tiştek heye em dev jê bernedin: Hîvî û ewleyî. Em vê vê şofê bi hev re bibuhurînin. Eyaleta me dikare vê bike. Ez hîvî dikim hebûna vê ramanê hêzê bide me û di di hefteyên pêş de tebata bivê bide me.

Hay ji xwe û hev û din hebin.

Her sax bimînin!

Bleiben Sie gesund!

Ihr Armin Laschet

Armin Laschet